

PAPER DETAILS

TITLE: Cotepeyv di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da

AUTHORS: Sevim Hatun Sürütü, Zafer Açıar

PAGES: 11-30

ORIGINAL PDF URL: <https://dergipark.org.tr/tr/download/article-file/4295476>

Cotepeyv di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da

Reduplication in the Mem û Zîn of Ahmadi Khani

Sevim Hatun SÜRÜCÜ

Sevim Hatun SÜRÜCÜ | 0009-0008-9970-9242 | sewimhatun@gmail.com
 PhD. Candidate at Bingol University, Institute of Living Languages, Department of Kurdish
 Language and Literature, Bingol, Türkiye

Zafer AÇAR

Zafer AÇAR | 0000-0001-5323-9531 | zafer13acar65@gmail.com
 Assoc. Prof. at Bingol University, Department of Kurdish Language and Literature,
 Bingol, Türkiye

Citation:

Sürütü, S. H. & Acar, Z. (2024). Cotepeyv di Mem û Zîna Xanî da. *Nubihar Akademi* 22, 11-27. DOI: 10.55253/2024.nubihar.1569071

Article Type	Research Article
Submission Date	17.10.2024
Acceptance Date	19.12.2024
Publication Date	31.12.2024
Peer-Review	Double anonymized - Two External
Ethical Statement	It is declared that scientific and ethical principles have been followed while carrying out and writing this study and that all the sources used have been properly cited.
Plagiarism Checks	Yes – iThenticate
Conflicts of Interest	There is no conflict of interest between the author and any parties in the article.
Complaints	The author(s) has no conflict of interest to declare.
Grant Support	The author(s) acknowledge that they received no external funding in support of this research.
Copyright & License	Authors publishing in the journal retain the copyright to their work licensed under the CC BY-NC 4.0 .

Puxte

Cotepeyv bûye têgeheke rêzimanî ku amaje bi dubareyên deng morfem an jî peyvan dike. Cotepeyvên ku weke dubareyan jî tên binavkirin ji bobihêzkirin, xurtkirin û dewlemendkirina wateyê tên bikaranîn. Di van komepeyvan de; yan heman peyv tê dubarekiran, yan peyvên nêzwate û dijwate ligel hev tên bikaranîn yan jî peyvên hevdeng li dû hevdu tên rêzkirin. Bi van taybetiyê xwe ve cotepeyv di helbest û

pexşanê da ji bo xurtkirin û dewlemendkirina wateyê ji aliyê edîb, şair û nivîskaran ve hatine bikaranîn. Ehmedê Xanî yek ji wan edîb û nivîskaran e ku di berhema xwe Mem û Zînê de ev komepeyv firawan bi kar anîne. Xebata me, nusheyên Mem û Zîna Ehmedê Xanî yên wekî ya Yıldırım (2010), Şemrexî (2011), Doskî (2013) û ya Dost (2020) ve hatine amadekirin da ber hev û cotepeyvên berhemê analîz kirin. Ev xebat ji destpêkek û du beşan pêk tê. Destpêk bi kurtasî çarçoveya têgehî û teorîk tevî rîbaz û materyala xebatê dihewîne. Di beşa yekem de cotepeyv ji aliyê teşeyê ve, ya duyem de ji aliyê zimanê hêmanê wê ve hatine dabeşkirin û ew bi mînakên Mem û Zînê hatine nimûnekirin. Di dawiyê de cotepeyvên ku hatine tesbîtkirin bi alfabetîk hatin rîzkirin û li xebatê hatin zêdekirin. Di encamê de divê em bêjin; me di Mem û Zînê de 826 cotepeyv tesbît kirin ku hinek ji wan dikarin daxîl ji kategoriyeke zêdetir bin.

Peyvîn Sereke

Komepeyv, Cotepeyv, dubare, Ehmedê Xanî, Mem û Zîn.

Abstract

As a grammatical concept, the reduplication refers to the repetition of sounds, morphemes or words. The reduplication, which is named as repetition, manifests itself in the form of repetition of the same word, synonymous word repetitions, close or opposite meaning word repetitions or homophonic word repetitions in order to strengthen the expression. In these respects, the reduplications have been preferred by poets and writers as a concept that enriches the narrative in poetry and prose. Ahmad-i Khani, one of these poets, used reduplications extensively in his work Mem û Zin. Our study analyzed the reduplications in Mem û Zin by comparing the copies of Mem û Zin annotated by Yıldırım (2010), Şemrexî (2011), Doskî (2013) and Dost's (2020). This study consists of an introduction and two chapters. The introduction briefly covers the conceptual and theoretical framework, the methodology and materials of the study. While the first part shows the reduplications in Mem û Zin in terms of form, the second part differentiates the reduplications according to the language they belong to. At the end, the reduplications identified were arranged in alphabetical order and added to the study. As a result, 826 reduplications were identified in Mem û Zin and it was stated that these reduplications can be included in more than one category.

Keywords

Phrase, reduplication, doubling, Ahmad-i Khani, Mem û Zîn.

Destpêk

Ji komên peyvan ên bi dubarebûna peyv an jî parçepenyvan saz bûne wekî cotepeyv hatine pênamekirin. Ji bo cotepeyvê navêñ wekî cotepeyv, dubare, komên dubareyan, komepeyv ku hemâ hemâ wateya wan yek e hatine bikaranîn. Cotepeyv di Osmanî da "atf-i tefsîrî"; Frensi da "redoublement"; İngilîzî da "reduplication, hendiadyoin"; Almanî da "Verdoppelung, Zwillingsformen, Hendiadyoin"; Tirkî da "ikileme" ye. Di xebatêñ li ser vê mijarê; em dibînin ku cotepeyv hem eleqe bi fonolojiyê (dubareyêñ dengan, rîtm û ahenga wan) hem morfolojiyê (dubareyêñ morfem û peyvan) û hem jî sentaksê (wekî komepeyv ku carna ji du peyvan zêdetir in) ve heye. Inkelas û Zoll (2000, r. 6) û Travis (2001, r. 455) nîşan didin ku xebatêñ pêşîn ên li ser cotepeyvan (bn. Wilbur 1973, Marantz 1982, Clements 1985, Kiparsky 1986, Mester 1986, Steriade 1988, McCarthy û Prince 1995) zêdetir bala xwe didane ser rehendêñ fonolojîk ên van komepeyvan. Wisa xuya dike di navenda vê nêzîktêdanê "dubarekirin" heye ku balê dide ser dengêñ rîtmîk û carîkirina wan dengan. Lî vê axiriyê tevî teorî û paradîgmayêñ fonolojîk rehendêñ morfolojîk û sentaktîk jî derketine pêş û bi gelek xebatan ev alî jî hatine teorîzekirin. Bo nimûne, Inkelas û Zoll (2000, r. 6) diyar dikin ku Rehêñ Teoriya Ducarîkirina Morfolojîk

(Morphological Doubling Theory) xwe dispêre pêşniyazên Hyman û yd. (1999) û wekî din ji hin hêlan ve sînordarkirina dubareyê (reh) ya Yipî (1995, 1998) û xebatê Downing û yd. (1997 û dewama wê) ên li ser fenomenên morfolojîk ên cotepeyvên zimanên Bantu. Dîsa xebata Travis (2001) nîşan dide ku cotepeyv nayê wê maneyê ku komepeyvên dujimarî ne lê ew dikarin ji du peyvan zêdetir bin ku tesfrê li peyvrêziyê dikan.

Derbarê pênase û kategorîzekerina van komepeyvan de gelek xebat hatine kirin. Yilmaz (2014, r. 114) ji bo cotepeyvê tegeha *ikileme* bi kar aniye û dibêje an ji bo danîna têkiliyêne wateyî di nav metnê da an jî ji bo pêkanîna nirxeke vebêjeyî ya stîlistîk, bikaranîna komepeyvên an ji heman peyvê an ji peyveke cuda pêk tê. Ergin (2003, r. 377), ji bo terma cotepeyvê peyva "tekrar"ê bi kar tîne û dibêje, tekrar (dubarekirin) ew komepeyv in ku ji bikaranîna du peyvên heman cinsî yên li du hevdu pêk tê. Li gorî wî sê fonksîyonên sereke yên cotepeyvan hene: 1.Bihêzkin 2. Zêdekin 3. Berdewamî. Karaman (2021, r. 890) derdibirre ku hin riste ji serî heta dawiyê li ser cotepeyvan hatine çêkirin, mijarên herî basit jî bi cotepeyvan hatine îzahkirin. Çar-penc peyvên cuda ku hemwate ne li dû hevdu hatine bikaranîn, ev nîşan dide ku cotepeyv ji aliye jimara peyvan ve nerm in. Anku dibe ku jimara peyvan ji duduyan zêdetir be. Cotepeyv ne di demeke kurt da, di şert û mercen guncaw da, bi geşepêdaneke 7-8 sedsalî da dikemilin û xweşik dîbin (Tuna, 1948, r. 429). Herwiha herdu peyvên cotepeyvê pêk tînin qalib digirin, ji ber vê yekê guhertina rêza peyvan ne mumkin e. Ku cihê peyvan bê guhertin wê cotepeyv xirab bibe. Lê belê di heman demê da hin cotepeyvên li derveyî vê qalibgirtinê dimînin jî hene (Hatipoğlu, 1972, r. 16).

Di lîteratura kurdî de jî, li ser vê mijarê xusûsen di berhemên rîzmanî de pênase û tesnîfî kirin hene. Tan (2015, r. 82) cotepeyvan dike sê kategorî. Baran (2012, r. 39-41) cotepeyvan di bin serenavê komepeyvan da hildide ber dest û ji aliyê teşeyê ve wan dike heft kategoriyan. Xebata Ertekin û Aşar (2015) yekem xebata misteqil e, bi kurmancî li sehaya Bakur, ku cotepeyvan pênase û kategorîze dike. Di soranî de ku wekî "cutewuşe" yan jî di hin berheman de "cutenaw" hatiye binavkirin di dawiya salêن heftêyî vir de xebat hene ku li gorî tesbîta me xebatê Nivîsarên li Kovara Beyanê (salêن 80yî), Nesrîn Fexrî (1983), Celal Mehmûd Elî (1979), Kewser Gelalî (1998) hin xebatê pêşîn in di vî warî de. Di zazakî de jî xêncî xebatê di pirtûkîn rîzmanî de wekî nivîsar xebata Gokalp (2017) dikare wek nimûne bê nîşandan.

Rêbaz û Materyala Xebatê

Ji bo ku em cotepeyvên di kurmancî da likar in yan jî hatine bikaranîn tesbît bikin me berê xwe da Mem û Zîn a Ehmedê Xanî. Mem û Zîn di tarîxa edebiyata Kurdî da yekem mesnewî ye ku bi awayekî rîk û pêk hatiye nivîsandin (Adak, 2013, r. 229). Ji *60 beşan* û ji *2656 beytan* pêk tê. Zimanê Mem û Zînê Kurmancî ye lê; Xanî, bi rîjeyêne cuda ji Erebî, Farisî û Tirkî jî istifade kiriye. Li gor tesbîta Yıldırım (2014, r. 37) di Mem û Zînê da rîjeya çar zimanan wiha ye: Kurdî 19601, Erebî 6015, Farisî 918, Tirkî 26 peyv in. Ji ber ku Mem û Zîn berhemeke Edebiyata Kurdî ya Klasîk e di nav xwe da ji bo spehîtî û zindîbûna vegotinê gelek hunerên edebî dihewîne. Ev jî rî dide ku cotepeyvên curbicur bêن çêkirin. Mînak tenasûb, digel hev bikaranîna du an ji duyan zêdetir peyvan e ku di navbera wan da têkilî heye. Mubalexe, ji bo biquwetkirina tesîra peyvê, zêdekin an jî kêmkirina hêmanekê ye. Tezad, bikaranîna wan hêmanan e ku bi wateya

xwe ve ew dijberî hev in. Tekrîr, ji bo tesîra peyvê xurttir bibe li pey hevdu dubarekirina peyvan e ku wateya wê derdikeye pêş.

Ev nivîsar ji bo tesbîtkirina cotepeyvên Mem û Zînê, têkilî zimannasiya metnî bi nêzîktê-daneke senkronîk, bi rîbaza wesfî dixebite. Bi vê mebestê, ji bo nimûneyan me çapê Mem û Zînê yên Yıldırım (2010), Şemrexî (2011), Doskî (2013) û Dost (2020) bi danberhevî analîz kir û nimûneyen xwe ji wan vebjartin. Herwiha ji bo tesbîtkirina peyvên Erebî û Farisî me ji Lûgata Develioğlu (2006) îstifade kir. Cotepeyvên ku weke mînak hatin nîşandan digel beyta ku tê da derbas dibin ji berhemâ Yıldırım hatin wergirtin, herwiha jimara beytan hat destnîşankirin.

Divê em vê yekê jî bêjin; ev xebat ne pênamekirin, kategorîzekirin an jî teorîzekirina morfolojîk an jî sentaktîk a vê babetê ye. Lê ev xebat li ser kategoriye diyar ên berê de hatine kirin dimîne û cotepeyvên Mem û Zînê "ji aliyê avabûnê" ve û "zimanê hêmanên wê" ve dike du beş û nimûneyen xwe wisa dide.

1. Cotepeyv di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da

1.1. Ji Aliyê Avabûnê ve Cotepeyv

Cotepeyvên vê kategoriye ser hev deh serenav û hin binbeşên hinekên wan dihewîne ku ew jî ev in: bi dûbarekirina heman peyvan hatine çêkirin, cotepeyvên bi dûbarekirina peyvên hemwate hatine çêkirin, cotepeyvên bi dûbarekirina peyvên dijwate hatine çêkirin, cotepeyvên bi dûbarekirina peyvên nêzwate hatine çêkirin, cotepeyvên bi dûbarekirina peyvên vedengî (olandar) hatine çêkirin, cotepeyvên peyveke wê biwate yek bêwate hatine çêkirin, cotepeyvên ji du peyvên têkilhev hatine çêkirin, cotepeyvên ji du peyvên hevdudanî hatine çêkirin, cotepeyvên ku gihaneka "bi" yê dikeve nava herdu ûnsuran, cotepeyvên cûrbicûr ên di Mem û Zînê da hatin tesbîtkirin.

1.1.1. Cotepeyvên bi Dûbarekirina Heman Peyvan Hatine Çêkirin

Ev cure cotepeyv ji dubarekirina heman peyvê pêk tên. Di Mem û Zînê da hejmara van cure cotepeyvan li gor tesbîta me 14 ne. Dem dem, sef sef, ref ref, çîn çîn û gulgul ji van çend mînak in. Peyvên bi wate hatine dubarekirin, ji mînakan çîn çîn bi rîya peyvên vedengî (reflection words) anku bi dubarekirina dengên siruştî pêk tê. Ev cure cotepeyv wateyên weke mibalexe, xurtkirin û zêdekirinê li hevokê bar dikin. Ev cure piranî ji hevdu cuda tên nivîsandin lê yên weke gulgul bi hevdu ve hatine nivîsîn jî hene.

Dem dem bide destê meyperestan

Xelqê ku hinek ji dil di destan (7/8)

Sef sef dimeşîne koh û deştan

Ref ref dixuşîne seyr û geştan (12/4)

1.1.2. Cotepeyvên bi Dûbarekirina Peyvên Hemwate Hatine Çêkirin

Ew cure cotepeyv in ku ji du peyvên hemwate pêk tên. Di Mem û Zîna Xanî da cotepeyvên hemwate hatin tesbîtkirin. Ji ber bandora edebiyata klasîk û zimanên serdest ê serdemê Erebî û Farisî peyvên hemwate yên Erebî-Kurdî, Kurdî-Erebî gel hev hatine bikaranîn. Cih û mekan,

meqsed û murad, ceng û herb, siyah û tarî, tifl û sebî çend mînakên cotepeyvên hemwate ne. Lê herçiqas wateya van bêjeyan weke hevdu xuya bike jî nayê wê wateyê herwext di şûna hevdu da bikaribin bêñ bikaranîn (Hatipoğlu, 1972, r. 58).

Go 'adetê pêşiyê zemanan
Ev bû li hemî **cih û mekanan** (11/15)

Têk çûne bi me'reza mezadê
Dildadeyê **meqsed û muradê** (13/4)

Mîr gote Memê bi kîn û kerb e:
Îro mi digel te **ceng û herb** e (43/17)

Rabûn ku şevek **siyah û tarî**
Şems û qemeran kirî tewarî (14/65)

1.1.3. Cotepeyvên bi Dûbarekirina Peyvên Dijwate Hatine Çêkirin

Ew cure cotepeyv in ku ji bikaranîna du peyvên dijwate pêk têñ. "Bi du peyvên dijwate Kurdan xwestiye têgiheke gelempêrî bi dest bixin" (Tan, 2011, r. 80). Gelempêrî cotepeyvên ku ji du peyvên dijwate pêk têñ sînorêñ têgiha ku ravekrina wê tê xwestin xêz dikin (Hatipoğlu, 1972, r. 59). Di Mem û Zînê da him cotepeyvên sade yên weke pêş û paş, roj û şev, jor û jêr ku îro roj di zimanê rojane da jî têñ bikaranîn hene him jî cotepeyvên Kurdi-Erebî û Erebî Kurdi ku di berhemêñ klasik da bêñ dîtin jî di zimanê jiyana rojane da nayêñ bikaranîn yên wekî leyî û nehar, xenî û beîs, şeb û rûz, zîr û bem, 'am û xas hene. Cotepeyvên dijwate wateyeke "nî-vendî" li hevokê bar dike, "Bi dûbarekirina du peyvên dijwate mirov dixwaze tiştekî texmînî bibêje" (Tan, 2011, r. 80).

Sazê dilê kul bi **zîr û bem** bit
Sazendeyê 'esqê Zîn û Mem bit (7/35)

Roj û şev û weqtê subh û êvar
Yeksan dinuma li wan bi yekcar (14/70)

Piraniya peyvên ku cotepeyvê pêk tînin qalib digrin, nabe ku cihê wan bê guhertin; lê di Mem û Zînê da hin cotepeyvên ku peyvên wan cih guhertine hatin tesbîtkirin. Mînak di beytekê da siyeh û sîfîd, di yekê da jî sîfîd û siyeh hatiye bikaranîn.

Her yek dikirin beyanê ehkam
Bextê **siyeh û sîfîd** ï'lâm (37/15)

Wellah ji sîfîdî û siyahî
Wî quesd û xerez tu yî llahî (60/52)

1.1.4. Cotepeyvên bi Dûbarekirina Peyvên Nêzwate Hatine Çêkirin

Ew cure cotepeyv in ku ji du peyvên nêzwate pêk têñ. Di navbera peyvan da him ji aliyê dengî ve him jî ji aliyê wateyê ve nêzikahiyek heye. Mînak bax û rax, gilî û gazin, çîl û çepî, îsm

û zemîr, îns û perî û hwd. Peyvîn ku cotepeyvê pêk tînin wateya xwe ya sereke winda nakin. Di Mem û Zînê da jimara cotepeyvên nêzwate ji 180 hebî derbas dike.

Ew herdu wekî du şebçiraxan
Gava dimeşîne **bax û raxan** (8/56)

Zahir dikirin ku zend û baz in
Êdî nediman **gilî û gazin** (8/51)

Qelp û dexel û bi dil neyar û
Pirr **çıl û çepî** xirab û xwar û (35/6)

1.1.5. Cotepeyvên bi Dûbarekirina Peyvîn Vedengî (Olandar) Hatine Çêkirin

Hin dengêni siruştî hene ku wextê derbasî nivîsê têni kirin cotepeyvên vedengî pêk tînin. Ev peyv piranî xwerû têni bikaranîn û wateyêne weke mubalexe û xurtkirinê li hevokê bar dikin. Ev cotepeyv ji aliyê şiklî ve dişibin cotepeyvên kategoriya “cotepeyvên bi dubarekirina heman peyvî” ya jorîn lê ferqa wan di mane û fonksiyana wan de heye ku yên vedengî piranî dengêne teqlîdî ne û aliyê wan yê muzîkal zêdetir li pêş e. Di berhemâ Xanî da ev cure cotepeyv zêde nebin jî hene. Weke çîn çîn, çeqçeqa û wd. Çîn çîn ji dubareya peyvîn vedengî ên xwerû pêk tê û peyv cuda hatine nivîsîn.

Çîn çîn bike turreê di şebreng
Gulgul veke ‘arizê di gulreng (27/24)

Aşê dev û **çeqçeqa** zebanan
Ava dehen û berê didanan (59/22)

1.1.6. Cotepeyvên bi Peyveke wê Biwate Yek Bêwate Hatine Çêkirin

Ev cure cotepeyv ji peyveke biwate û peyveke bêwate pêk têni. Di van cure cotepeyvan da yan peyva ewil yan jî ya duduyan biwate ye, peyvîn mayî wateya peyva biwate xurttir dikin (Hatipoğlu, 1972, r. 58). Peyvîn ku cotepeyvê pêk tînin li gor rêgezan nayênen rêzkirin yanî ewil peyva biwate ya a bêwate wê bê ne diyar e (Telli, 2017, r. 142). Di Mem û Zînê da mînakênen wê hene: bejn û bal, xan û man, hîle û surde, xar û xes û hwd.

Agir ku digirte **xan û manan**
Wî girte bi gazî û fîxanan (41/16)

Deh carî bi heqqê **bejn û balê**
Çîl carî bi heqqê zulf û xalê (44/28)

1.1.7. Cotepeyvên ji du Peyvîn Têkilhev Hatine Çêkirin

Hin cotepeyv hene ku bêjeyêne wan wexta bi hevdu ra têni bikaranîn hevdu temam dikin û her yek xwe wekî perçeya tevahiyê nîşan didin (Ertekin û Aşar, 2015, r. 84). Di Mem û Zînê da ji ber tesîra edebiyata klasîk ev cure cotepeyv zêde hatine bikaranîn. Li gor tesbîta me jimara vê cure cotepeyvê ji 250 hebî zêdetir e. Pîr û kal, nan û av, av û gil, xal û xet, zulf û xal, can û dil, ser û pê, xeyl û xeşem, zend û baz û yd.

Lebteşne teleb dikan zelalê
Wê dane û damê **zulf û xalê** (2/38)

Pêxemberê cem'ê cuz û kul bû
Adem bixwe hêj **av û gil** bû (3/20)

Bîlcumle diçûne der ji malan
Hetta digehîste **pîr û kalan** (11/18)

1.1.8. Cotepeyvên Hevdudanî yên bi Navbendekê Têne Girêdan

Ev cure cotepeyv ji du peyvên an bi gihaneka "o" û "û"yê yan bi navbendekê digihêne hevdu (Ertekin û Açar, 2015, r. 85). Bo nimûne:

Sê roj û şevan bi dil **peyapey**
Wan teşneleban vexwarin ew mey (25/19)

1.1.9. Cotepeyvên ku Daçeka "bi" yê Dikeve Nava Herdu Ünsuran

Ev cure cotepeyv bi daçeka "bi"yê ve têne girêdan ku herdu hêmanên cotepeyvê eyñî peyvîn. Di Mem û Zînê da jî mînakên bi vê cureyê çêbûyî hatine tesbîtkirin; "ca bi ca, dem bi dem, dest bi dest, leb bi leb û wd". Kızıl (2019, r. 1534-1535) çend fonksiyonên vê daçeka kurmancî dide ber "by" a îngilizî û nîşan dide ku "bi" wekî daçek dikeve navbera peyvên dubare yên kurmancî di maneyên ciyawaz de. Wekî ku di mînakan da jî tê dîtin daçeka "bi" dikeve nava herdu ünsurên ku cotepeyvê pêk tînin.

Wî sebzeyî **dem bi dem** bi xûne
Dê avi biden ji paşı bûne (59/42)

Evrengehe **dest bi dest** bi rê ve
Ew mertebe mertebe bi wê ve (59/57)

1.1.10. Cotepeyvên Cûrbicûr ên di Mem û Zînê da Hatine Tesbîtkirin

Di Mem û Zînê da ji bilî cureyên cotepeyvan ên li jorê hatin behskirin hin cureyên din jî hatin tesbîtkirin. Cotepeyvên bi gihanek û daçekên weke "...û...û...", "bi...bi...", "hem...hem...", "ne...ne...", "hin/hindek...hin...", "ger/eger...ger...", "çi...çi...", yê hatin tesbîtkirin.

1.1.10.1. Cotepeyvên bi Gihanekên Cûrbicûr Hatine Çêkirin

Gihaneka ger, û, hem...hem..., ne...ne..., hin...hin..., çi...çi... di çêkirina cotepeyvan da hatine bikaranîn.

Hejmara gihanekên bi gihaneka "...û...û..." yê hatine çêkirin ji 140 hebî zêdetir e. Bi vê gihanekê cotepeyvên nêzwate, dijwate, hemwate û têkilhev ku jimara peyvên wê sisê ne têne çêkirin. Mînak; dildar û şepal û nazenîn, bira û bab û ap, cunûn û dîn û har. Hin cotepeyvên bi rêya gihaneka "...û...û...û..." yê têne çêkirin jî hene ku di vê cureyê da jimara "û"yê dibe sisê û jimara peyvên ku cotepeyvê pêktînin jî dibe çar. Mînak; hor û melek û perî û wîldan, zînet û xeml û xişt û henbel û yên wekî wan.

Li dû hevdu rêzkirina çar-pênc peyvên nêzwate û dijwate ji aliyê jimara unsûran va nerm-bûna cotepeyvan nîşan dide (Karaman, 2021, r. 890).

Serxweş ke li gerdenê guharan
Sersemke **cunûn û dîn û haran** (27/39)

“ger/eger...ger/eger...”:

Newbar e **eger şirîn eger tal**
Metbû' e ji rengê new'ê etfal (7/56)

“hem...hem...”:

Însan bixwe **hem zelam e hem nûr**
Adem ji te **hem qerîb e hem dûr** (1/24)

“ne...ne...”:

Ne fehm û xîred **ne ‘eql û ne hûş**
Gêr bûne li ser zemînî medhûş (14/29)

“hin/hindek...hin...”:

Hindek di betî’ û hin serî’ in
Hindek di me’în û hin menî’ in (11/6)

“çı...çı...”:

Fîlcumle **çı ewwel û çı axir**
Elqisse **çı mu’mîn û çı kafir** (2/24)

1.1.10.2. Cotepeyvên bi Daçekan ve Hatine Çêkirin

Di Mem û Zînê da hin cotepeyv hene ku bi alîkariya daçekên “bi” û “bê”yê hatine çêkirin. Daçeka “bi” wateyên wekî alîkariya amrazekê, ber bi cihekî ve hereket kirin, dabeşkirin, rûbirû, sond, xwedîtî û wd. dide (Yıldırım, 2012, r. 269-270). Daçeka “bê” jî wateya neyînîtî û tunebûnê dide. Di berhemê da 9 cotepeyvên bi “bi” û 5 cotepeyvên bi “bê” yê hatine tesbîtkirin. Mînak; bi batin û bi zahir, bi nesîhet û bi pend, bi roj û bi şev; bê nam û nîşan, bê rewac û mexşûş, bê bab û yetîm û wd.

Cotepeyvên bi gihanek û daçek ji hevdu cuda têr nivîsîn û him daçek him jî gihanek dikevin navbera herdu peyvan, wan bi hevdu ve girê didin.

Bê tu’me û bê şerab û bêçav
Bê meqsed û bê murad û bêgav (15/11)

Bênam û nîşan û xeyrî û me'rûf
Qelbê we bi wan ku bûye meşxûf? (17/17)

Hukkam **bi batin û bi zahir**
Bê şubhe müşabih in bi agir (26/79)

Li jor di bin deh sernavan de me cotepeyvên Mem û Zînê nimûne kirin. Li jêr em ê li ser tabloyekê jimarên wan nîşan bidin:

Tablo 1. Ji Aliyê Avabûnê ve Cotepeyvên di Mem û Zînê da

Cureyên Cotepeyvan	Hejmar
1. cotepeyvên bi dûbarekirina heman peyvan hatine çêkirin	14
2. cotepeyvên bi dûbarekirina peyvên hemwate hatine çêkirin	96
3. cotepeyvên bi dûbarekirina peyvên dijwate hatine çêkirin	70
4. cotepeyvên bi dûbarekirina peyvên nêzwate hatine çêkirin	187
5. cotepeyvên bi dûbarekirina peyvên reflection hatine çêkirin	2
6. cotepeyvên peyveke wê biwate yek bêwate hatine çêkirin	4
7. cotepeyvên ji du peyvên têkilhev hatine çêkirin	248
8. cotepeyvên hevdudanî yên bi navbendekê têne girêdan	1
9. cotepeyvên ku daçeka "bi" yê dikeve nava herdu ûnsuran	4
10. cotepeyvên cûrbicûr ên hatin tesbîtkirin	200

1.2. Li gor Zimanê Hêmanê wê Cotepeyvên di Mem û Zînê da

Di vê kategoriyê de, em ê cotepeyvên ku ji hêmanê wê ji zimanê ciyawaz pêk tên nimûne bikin ku bi vê em ê nîşan bidin Ehmedê Xanî digel zimanê xwe û devokên Kurmancî (Bohtî, Mihemedî û Silîvî) Erebî, Farisî û Tirkî jî dizanibû. Di Mem û Zînê da li gor zimanê avabûnê cotepeyvên ku hatin tesbîtkirin wiha ne: Cotepeyvên Kurmancî+Kurmancî, Kurmancî+Erebî, Kurmancî+Farisî, Erebî+Kurmancî, Farisî+ Kurmancî, Erebî+Erebî, Erebî+Farisî, Farisî+Erebî.

Hêjayî gotinê ye ku ji bo her cureyê sê mînak hatin hilbijartin û di beytan da hatin nîşandan.

1.2.1. Cotepeyvên bi Kurmancî+Kurmancî

Cotepeyvên ku herdu peyvên wan jî Kurmancî ne di berhemê da hatin tesbîtkirin. Mînak; jor û jêr, şev û roj, agir û av û wd. Ev cotepeyvên ku herdu peyvên wan jî Kurmancî ne îro roj jî di zimanê rojane da tên bikaranîn.

Ev lengeriyê di **zîv û zêrîn**
Şubhet felekê di **jor ê jêrîn** (22/49)

Ev ax û hewa û **agir û av**
Ev leyîl û nehar û sî û sîtav (26/8)

Ye'nî **şev û roj** û subh û şam in
Hin rohnîn e hin ji wan zelam in (48/17)

1.2.2. Cotepeyvên bi Kurmancî+Erebî

Cotepeyvên ku peyveke wan Kurmancî û yek Erebî ye hatin tesbîtkirin. Peyva ewil a cotepeyvê Kurmancî ye û ya pey ra tê Erebî ye. Mînak; pêl û mewc, jar û ze'if, dujmin û reqîb û wd.

Pêla ku digirte **pêl û mewcan**
Roja dikete hezîz û ewcan (9/6)

Lê **jar û ze'if** û bê mecal e
Aşufteyê rûyê werdê al e (38/10)

Ger qismê muhib weger hebîbin
Elbette bi **dujmin û reqîbin** (24/38)

1.2.3. Cotepeyvên bi Kurmancî+Farisi

Cotepeyvên ku ji peyveke Kurmancî û yeke Farisî pêk têñ jî hatin tesbîtkirin. Ewil peyva Kurmancî peyra jî ya Farisî tê, Kurmancî+Farisî. Mînak: bêhn û boy,

Sergermi bûyin bi guftûgoyê
Sermesti bûyin ji **bêhn û boyê** (52/53)

1.2.4. Cotepeyvên bi Erebî+Kurmancî

Cotepeyvên ku peyva wan a ewil Erebî û ya peyra Kurmancî ye. Di berhemê da cotepeyvên Erebî+Kurdî yêñ wekî tifl û sebî, subh û êvar, zen û guman û hwd. hatin tesbîtkirin.

Roj û şev û weqtê **subh û êvar**
Yeksan dinuma li wan bi yekcar (14/70)

Dam û ded û ademî û heywan
Tifl û sebî, aşivan û rezvan (36/24)

Ev **zen û guman** û 'ilmê teqlîd
Tebdîl bibin bi 'eynê tewhîd (59/81)

1.2.5. Cotepeyvên bi Farisî+Kurmancî

Hin cotepeyvên wekî tehl û tirş, şad û xemgîn, ser û pê û hwd. ku di Mem û Zînê da hatin tesbîtkirin Farisî+Kurmancî ne.

Can û ceger û dil û hinavan
Dest û **ser** û **pê** û pişt û çavan (15/46)

Xîzan û geda xenî û zengîn
Şadan û hezîn û **şad** û **xemgîn** (23/65)

Ew şerbet eger şîrîn e xam e
Wer **tehl** e û **tîrs** e natemam e (59/59)

1.2.6. Cotepeyvên bi Erebî+Erebî

Di mesnewiyê da cotepeyvên xwerû Farisî+Farisî nehatin tesbîtkirin, lê cotepeyvên Ere-bî+Erebî hene. Mînak ebleh û sefhî, îsm û zemîr, leyîl û nehar, batîn û zahir û hwd.

Ez dê nihe remlekê birêjim
îsmî û **zemîrî** ez bibêjim (16/20)

Ev ax û hewa û agir û av
Ev **leyîl** û **nehar** û sî û sîtav (26/8)

Nabalix û **ebleh** û **sefhî** in
Ya zahid û soffî û feqîh in (58/27)

1.2.7. Cotepeyvên bi Erebî+Farisî

Cotepeyvên ku peyveke wan bi Erebî û yek bi Farisî ne jî hatin tesbîtkirin. Mînak cunûn û şeyda, hor û perî û wd.

Ew **hor** û **perî** di bêbedel bûn
Lewra ku ji nûrê lemyezel bûn (8/32)

Herçî li me bû duçar û peyda
Hazir geriya **cunûn** û **şeyda** (16/23)

1.2.8. Cotepeyvên bi Farisî+Erebî

Cotepeyvên ku peyveke wan bi Farisî û yek bi Erebî ye hatin tesbîtkirin. Peyva ewil a cotepeyvê Farisî ye û ya peyra tê Erebî ye. Mînak; bend û qeyd, feryad û fixan, ceng û cîdal, geşt û seyran û hwd.

Roja weku çûne **geşt** û **seyran**
Wan dîne li rê du dîdeheyran (19/8)

Hazir nebitin kesek di seydê
Ew dê bimirit di **bend** û **qeydê** (36/19)

Bê **ceng** û **cîdal** û bê tehewur
Qet vî şuxulî mekan tesewur (46/16)

Di binbeşa li jor de li gorî zimanê hêmanên cotepeyvê nimûne hatin pêşkêşkirin. Îja li jêr em ê li gorî rêza alfabetik wan pêşkêş bikin:

'am û xas	bax û bostan	bixûr û 'ûd û'enber
'amî û xewadim û xewas	bax û buhar û berg û esmar	bizeban û baxeber
'aqil û 'ezîz	bax û mehbûb	bûbekr û 'umer
'asî û şeqî û natemam	bax û rax	bûk û zava
'bedî û seyyar	bê cerhe û qerhe û birîn	bulh û natemam
'ebîd û azad	bê nam û nîşan	buraq û refref
'ehd û peywend	bê rewac û mexşûş	buzurg û kûçek
'elehî û se'alîk	bê şu'le û pêt û bê çirûsk	ca bi ca
'elîl û 'illet	bêbab û yetîm	cahil û nezan
'enasir û sehab	bedesl û seffîd û bedfi'al	cahil û ummî û sefil
'eql û ferr û ferheng	bedfê'l û sitîzekar û salûs	cam û qedeh û eyax
'esq û mehebbet	bedxwah û pexîl û bedsigal	can û ceger
'eta û bexşîn	begzade û sade û rûwal	can û cism
'eyş û 'îşret	bêhêd û qiyas	can û dil (3)
'eyş û kamiranî	bêhn û boy	cariye û xulam
'eyş û neşat û şadimanî	bejn û bal (2)	cawnî û behar
'eyş û xweşî	bela û bend	cebr û îkrah
'ezîm û dewwar	bêlîbas û tazî	cehennem û 'ezab
'ezra û ruwal û bikr û murdan	bend û leyiz û cih	celal û rehmet (2)
'îd û tehwîl	bend û qeyd	cemad û heywan
'ilm û hîkmet	bend û seqet û xîlaf û kalan	cenet û sewab
'îzam û cild û hemdem	bendî û hebsî û girîftar	ceng û cîdal
'izz û naz (3)	bênezir û hemta	ceng û herb
'izz û rif'et	bêquwet û bêtuwan	ceng û perxaş
'izz û temkin	ber û binagûş	cennet û hûr
'uqab û bazî	berg û bar	cewaz û ruxset
'usman û 'Elî	betal û zail	cewr û sitem
'uzam û cedd û walid	betî û dair	cih û mekan
ab û abgîn	beyaz û humre	cih û wusaq
ab û xak	beyda û demen	cism û can (2)
ademî û heywan	beyt û hecer û meqam û hucre	cundî û sipahî û emîran
agir û av	beyt û hecer û tewaf û 'umre	cunûn û dîn û har
ah û efxan	bêzeban û xamûş	cunûn û şeyda (2)
ah û feryad	bi batîn û bi zahir	cunûn û waleh
asîman û 'erd	bi hevalî û bi wehdet	cuz' û kul
ates û bad	bi nesîhet û bi pend (2)	çarîsû û sûk
av û gil (2)	bi roj û bi şev	çeqçeq
av û gil	bi te'emmûl û bi îdrak	çerx û baz û govend
ax û ber	bi tebayî û bi kesret	çerx û felek
ax û hewa	bi tewazu' û bi te'zîm	çeşm û leb û sîne
axa û ekabir û feqîr	bihîstîn û rewayet	çi can û çi eşbab
axû 'erd	bihîşt û nîran	çi ewwel û çi axir
ayat û suwer	bil batîn û bi zahir	çi mu'min û çi kafir
bab û pis	bilezzet û bitam	çi qalb û çi meqlûb
badenoş û serxweş	bira û bab û mam	çi telib û çi metlûb
bajîr û kelat û xanî	bîsat û esbab	çi ten û çi erwah
bar û zehmet	bisk û xal	çîl û çepî
barid û harr	bisk û zulf û xal	çîn çîn
batîn û zahir		dad û dîn û dewlet

dam û ded (2)	ebleh û sefih	gilî û gazin
damad û 'erûs	edanî û erazil	gul û sunbul
dane û dame	edanî û esaxir	gulab û gulqend
dar û ber (2)	eger şirîn eger tal (2)	gulab û misk û 'enber
dawudî û sibtî û nesara	ekabir û xewas	gulgul
dax û derd	elfaz û me'anî û 'ibarat	gulşen û gulistan
debîq û diba	elmas û zumurrud û mirarî	gustax û sitemger û siyehker
def û ribab	emîr û xîlman	hakim û emîr
delfîl û burhan	emlak û cewahir û xezîne	hamd û şukr
dem bi dem	enîn û efkan	hamşadî û hemcefa û hemdem
dem dem (3)	eqd û sîdaq û mehr û kabîn	hat û bat
der û ban	eql û xired û şu'ûr	hebîb û aşiq
der û deş	eqwam û qebayil û 'eşayir	hedd û xayet
derd û ah û wah	erd û asîman (2)	hem bayî û hem xerîdar
derd û derman	erd û sema	hem kîtab e hem şîr
derd û êş	erz û asîman	hem qerîb e hem dûr
derwêş û re'iyye û feqîr	esbab û tecemmul û define	hem resul e hem mîr
dest bi dest	esl û bîx	hem zelam û hem nûr
dest û ezman	eşq û wumqan	hemâsiyan û hemper
dest û pê (2)	eyd û sersal	hemnefes û heval û hemdem
dest û pê û dawan	fanî û jar û muştixak	hemraz û emîn û nazenîn
dest û pence	faris û gurd û pehlewan	hemser û hemnişîn û hemraz
dest û pî û çav sêv û ruteb û	feda û qurban	hemşire û hemcenah û hemser
enar	fehm û xîred	hemzad û heval û hemnişîn
dest û ser û pê û pişt û çav	fîris û betl û sînesaf	heqîqat û mecaz (2)
dev û kepî	feryad û fixan	hesar û hebs û zindan
dewa û derman	fesl û eyyam	heyat û kewser
dewab û însan	fezail û fuzûlî	heywan û nebat û me'iden û ferş
dewende û perrende	fikr û zikr	heywanê û me'adîn û nebatat
dewlet û se'adet	fil û ferzin	hezîn û gîryan
di hindik û di nadir	fil û rex û kergedan	hezîn û nalan
diba û herîr û xêz	fitne û fesad	hezl û baz
dijmin û reqîb	fixan û ah û zarî	hîcab û perda
dikan û sûk	fixan û feryad	hîcab û tor
dil û can (4)	fixan û gazî	hicr û wîsal
dil û ceger (2)	fixan û xulxul	hîle û xurde
dil û hinav (3)	fixan û zarî	hîlekar û cazû
dildar û şepal û nazenîn	furaf û ceyhûn	hin 'eqliremîde hin muşseweş
dîn û dewlet	fuzûl û herzekar	hin camederîde û hin serxweş
dîn û îman	gah gahî	hin mu'telif in hinek muxalif
dîndarî û dewlet û diyanet	gazî û fixan	hin mudbir û hinek mudebber
dînê û axîret	gazî û xuroş	hin muxtelif in hinek mu'alif
dirav û dînar	geh gahî (2)	hin rojperest û hin şebefrûz
dîtin û şehadet	geh geh	hin xusserrevîn û hin xemendûz
dîwan û meclis	genç û mal (2)	hindek di betî' û hin serî
duçar û peyda	ger kafir û ger gunehikar	hindek di heram û hin di tarî
duçar û zahir	ger melek û eger beşer	hindek di me'în û hin menî'n
dûşîze û doxter û ruwal	ger roj û eger şev	hindek di peya û hin siwar in
dûşîze û nû'erûs û bikr	gerden û dest û pê û zencîr	hindek di seqîl û hin xeffî
dûxan û yehmûn	gerden û dûş	hindek di şefaf û hin ditarî
e'alî û ekabir	geşt û seyran (3)	hindek di xeffî û hin letîf
e'yan û ekabir û e'alî	geweşt û şehnaz	hor û melek û perî û wîldan

hor û perî (2)	mawerd û zabad û misk û 'en-	muhal û müşkil
hor û xilman (3)	ber	muhibb û mehbûb
horf û perî û xemrevîn	mawerd û zebad û misk	mulk û mal û millet
hûrî û melek	me'cer û burqe û serendaz	mumkunat û wacib
husn û cemal	me'shûq û hebîb	munasib û muwafiq
îhtiram û tekrîm	mecrihu û ze'if û dilefgar	munîr û rewşen
îlm û huner û kemal û îz'an	medar û teskin	muqîm û sair
îns û can (3)	meh û mîhr (2)	mûrad û meqsed (2)
îns û perî	mehelle û zikak	murîd û murad
înşa' û mebanî û işarat	mehîbb û mehbûb	murşîd û pêşewa
îsm û zemîr	mehr û bawefa	murşîd û rehber û delil
îxfa û texâful û tehemmûl	mehr û muşterî	musafîh û mu'aniq
îhtraz û î'râz	mehr û wefa	musella û meqam
ins û can	mehrûm û sefil û bênesîbek	museyqel û munîr
îşaret û mu'emma	mekesl û melabis	muşteha û mehbûb
jar û ze'if (2)	mekr û kizb û tezwîr	muşteha û mehbûb
jar û ze'if	mela û şêx û mîr	mûtî û muhtaç
ji nû ve û tekrar	mela û xetîb	mûtî' û munqad
jor û jêr	melul û me'yûs	mutrib û saz
kafir û musulman	melul û mehbûs	muzekker û muennes
kar û bar	melul û mexbûn	mulk û mal
kebk û qaz	mem û zîn (11)	muzekker û muennes
keç û kurr û rûwal	menazîl û meqamat	muzeyyen û mulebbes (2)
kem û keyf	menna' û muzebzebîn û îblîs	nam û neseb
kerb û elem	mensûb û muselsel	nan û av
kerker	menzer û meher	nar û nûr
kêşan û keşan	meqsed û me'nî	narinc û turinc (2)
kewn û mekan	meqsed û murad (2)	nav û nişan
kibr û kîn	mêrinî û xîret û celadet	ne 'eql û ne hûş
kîj û kur	mermûz û menaqib û dirayet	ne murde û ne ehya
kîzb û teswîl	mertebe mertebe	ne qîl e ne qal
koh û deşt	mesken û mal	ne serxweş û ne mest
koh û deşt	meş'el û fener	ne şem' û ne çira
kohî û kenarî	meta' û kala	ne ten û ne can
kubera û kurdemîr	metlûb û meqasid û mûradat	ne xewn e ne xeyal
kuçe û xurfe û şibak	mewan û hîcâb	ne xwer ne xwabek
kufr û guneh	mewt û heyat	ne yar û ne hemnîşîn
kufr û îman (2)	mewzû û meqasid û hîkayet	nebat û heywan
kûs û def û kerrenay û naqûr	mexmûr û siyah û mest û bimar	nebat û insan
le'b û baz	mexmûr û siyahîmest û sekran	nedan û aşîkar
le'b û bend û bazan	mezaq û meşreb	nedîm û nas (2)
leb bi leb	milk û melek û felek	nedîm û yar (2)
leble'l û semen'îzar û gulrûx	mîr û axa	nefs û dil û can
letîf û nazenîn	mîr û geda	nelayiq û leîman
letîf û xendan	mîr û padîşah	nemmmam û hesûd û hîlekar
lêv û zeqen û enar	mîr û paşa	neqs û nîşyan
lewh û qelem û sewabit û 'erş	misal û hemta	nergis û lale
leyal û nehar (2)	mîsal û teswîl	nesl û neseb û heseb
lutf û husn	mu'cîz û keramet	neşat û 'eyş û 'îşaret
lutf û kerem	mudd'a û metlûb	newal û kûh û deşt
ma' û tîn	muddea û metlûb	nexs û suls
mal û menal	muffîd û mustefad	nezm û tertîb (2)

nî'met û nefais	remz û îma	serw û şimşad
nijdeyan û cerdan	reng û rû	serxwes û muşewweş
nişat û kameran	reqs û baz	setrenc û nerdan
nîzam û intîzam	reqs û govend (2)	sewda û fûad û xebl û mexmûr
nûr û nar (2)	resm û 'adet	seyadet û eyb
nûr û zelam	resm û ayin (2)	seyr û geşt
nutq û xeber	retb û yabis	seyr û sulûk
nuzhetgeh û şehnîşîn û eywan	rewneq û rohnî û kemal	sî û sîtav
pakîze û pakibaz	reyhan û binefş (4)	sidq û îman
pêl û mewc	rifq û rehmet	sidq û wefa
pencer û şebak	rih û ceset	sîfat û ef'al
pend û xelêt û xiñaf û yalan	riha û sunbul	sîfîdî û siyahî
perr û bal	riza û nam û namûs	sihhet û şîfa
perwaz û firr	roj û şev (3)	silah û gurz û şîmşîr
pêş û paş	rû be rû	sîxar û kubbar
peyapey	rûh û cesed	siyah û tarî
peyman û qesem	ruh û qalib	siyeh û sîfîd
piling û tazî	ruh û qelb	soffî û mela
pîr û kal (4)	rûm û 'ecem (2)	sorgul û sunbul
pîş û pes	rûm û 'ereb û 'ecem (2)	sot û kul
qail û fa'il û xudan	rûm û hebeş û fireng û tatar	sûbaşî û şehne
qavil û xebîrî	rûx û binagoş	subh û êvar
qaz û quling û kebk û teyhû	ruxsar û zeqen	subh û şam
qebra û sema	sade û rûalan	sunbul û lale
qedîm û layezal	sadiq û rast	sunbul û sorgul
qedîr û zulcelal	saf û bêbeha	sûr û matem
qelb û can (2)	saqî û şerab	şad û xemgîn
qella' û qellaş	saxir û fisûnger	şad û xendar
qemsî û xar û rûsiyah	se'y û teleb û tewaf û 'umre	şad û xurrem (2)
qend û şeker	sebr û saman	şadan û hezîn
qendlîl û fitil	sebr û sukûn	şah û wezîr
qerar û temkin	sebûr û xursend	şah û xûndikar
quesd û xerez (2)	seda û gazegaz (2)	şahî û sefa (2)
qet' û fesle	sef sef	şahî û xem
qettal û dilawer û cegerdar	sefa û zewq û suhbet	şai'r û feqîr
qewal û muxennî û xezelxwan	sefil û bêxudan	şê'r û xezel û kitab û dîwan
gewam û quwet	sehîh û mursel	şeb û rûz
qewl û qerar	sehîqed û serefraz	şefa û tarî
qeyd û bend	sêhr û mu'icizat	şehadet û xeyb
qeyd û zencîr (3)	sehra û çîmen	şems û qemer (4)
qeyser û sâk	sehw û xelêt (2)	şer' û sunet
qeza û sunnet	sekinîn û mutmeîn	şerab û qend û şekker
qible û kabe	selasil û qeyd	şerbet û şerab
qibleghâ û mescûd	ser ser	şerbet û te'am
qiyas û te'iwil	ser û pê	şerbet û vexwarin
qur'an û xeber	sera û bostan	şetul'ereb û ferat û ceyhûn
ramîşger û xweşşnewa û xweş-	serdarî û sewlet û siyanet	şev û roj
deng	serdefter û serwer	şewq û ziya û nûr û lem'an
ref ref (2)	serniwişt û sermeşq	şeyda û cunûn û mubtelâ
refiq û rehber	sersalî û bakir û rûwal	şîmşad û çînar
rehm û riqqet (2)	sersam û dewar û ser' û meh-	şîr û şeker
remz û hal	mûr	şîr û şeşperr (2)

şîwen û şahî	xafil û 'atîl	xubar û hûr
şîwen û şîn	xaib û hazir	xuld û nîran
şûr û şer	xak û xaşak	xuld û seqer
şûşe û mendela	xal û nuqet	xull û zincîr
tab û taqet	xal û xet	xurşîd û meh û nucûm
tac û tomar	xal û xet û turre	xurûc û tehrîk
te'essub û eşîrî	xalis û temîz	xwar û zelil û xakisar
teb û tab	xan û man	yaqqût û zumrurrud
tebl û 'elem	xanim û xewatîn	yar û ehbab
tecemmul û melabis	xar û xes	yar û exyar
tecezzu' û temekkun	xas û 'aman (2)	yarî û birayî û mu'axat
teferruc û temaşa	xayin û xwar	yemîn û ewseng
tehl û tirş	xebîs û xennas	yemîn û qenbel
têk têk	xedda' û xeberbezîn û telbîs	zahid û sofî û feqîh
tekkelum û xeberdan	xedeng û xencer	zalim û 'ewan
tella û şîban	xefîf û mexbûn	ze'îf û jar (2)
teng û tarî	xelq û nas	zebt û neseq û nîzam û dîwan
tengî û cefa	xeml û rewneq	ze'lîf û dilefgar
tenha û tehin	xemze û awir	zelil û mehbûs
tenha û tenê	xenc û naz	zen û guman
terz û uslûb	xenc û nazan	zend û baz
text û ewreng	xenî û bais	zêr û zîv
tifl û sebî	xenî û zangîn	zerb û tezyin
toz û gerd	xerabî û xebîsî	zerîr û zergûn
tûl û 'erz û umq	xerb û şerq	zêrr û wereq û cewahir û durr
turk û taçîk	xergûş û xezal û gûr û ahû	zewq û caf
tûtî û qumrî	xermohrî û morik û mirarî	zewq û fereh
ûslub û sifat û me'ne û lefz	xesm û dujmin	zewq û sefa û 'eyş û noş
wehş û teyr (2)	xet û xal (2)	zîlb û tezyin
wehşî û xebel	xeta û nîşyan	zîn û mem (4)
wehy û tenzil	xeta û sehw	zînet û xeml û qışt û henbel
welwele û fixan û zarî	xewas û 'amî	zîr û bem (3)
weqar û 'eqîl û ferheng	xeyl û heşem	zîv û zêr
weqt û gav (2)	xezal û gur û xergûş	zulf û gîşû
wezîr û serwer	xirab û xwar	zulf û xal (11)
wezn û qîrat	xiza û xwarin	zurna û nefîr û kûs û me
wucûb û îmkân	xîzan û geda (2)	

Encam

Xebata me cotepeyvîn di Mem û Zînê de tesbît kirin ku ew jî bi qasî 826 heban e ku hinek ji wan xusûsiyetêni ji kategoriyeke zêdetir dihewînin. Cotepeyvîn ku me tesbît kirin me li gorî avadanî û zimanê hêmanên wê dabeşkirin. Di encama xebatê da hin taybetiyêne cotepeyvan ên hatin tesbîtkirin ev in:

1. Mem û Zîn berhemeke dewlemend e ji aliyê cotepeyvan ve çi ji aliyê mîjerê çi ji aliyê cureyêne cotepeyvan ve be.
2. Ehmedê Xanî digel zimanê xwe û devokêne Kurmancî (Bohtî, Mihemedî û Silîvî) Erebî, Farisî û Tirkî jî dizanibû ku bi bikaranîna cotepeyvan bi zimanên ciyawaz vê yekê baş nîşan dide.

3. Janrayên cotepeyvên di berhemê da ji hevdu cuda ne û hejmara wan jî diguhere:
 - a. Herî zêde cotepeyvên têkilhev hene ku hejmara wan ji 240î zêdetir in. Peyra cotepeyvên nêzwate (ji 180î zêdetir) û cotepeyvên hemwate (ji 90î zêdetir) tên.
 - b. Herî kêm cotepeyvên vedengî hene ku tenê du mînakên wê hatin tesbîtkirin.
 - c. Di berhemê da hin cotepeyvên ku di bin serenavê "cotepeyvên cûrbicûr" da hatin dayîn hene ku bi alîkariya daçek û gihanekan hatine çêkirin.
4. Hat tesbîtkirin ku zimanê avabûnê yê cotepeyvan jî ji hevdu cuda ne. Digel cotepeyvên xwerû Kurmancî yêن wekî jor û jêr, agir û av, şev û roj cotepeyvên Kurmancî+Erebî, Erebî+Kurmancî, Farisî+Kurmancî, Erebî+Erebî, Erebî+Farisî, Farisî+Erebî hatin tesbîtkirin.
5. Cotepeyv bi giştî bi gihaneka "û" yê bi hev du ra hatine girêdan.
6. Taybetiyeke din a cotepeyvan ew e ku cotepeyvên ku heman wateyê didin; di beytên cuda da, di şûna dubarekirinê da, bi peyvên cuda hatine dayin. Mînak: Erd û asîman di du beytan da hatiye dubarekirin lê di du beytên cuda da, di şûna vê da; erd û sema, erz û asîman hatine bikaranîn ku ev jî nîşaneyeke xurtbûna zimanê berhemê ye.
7. Cotepeyv bi demên dirêj ra qalib digrin, li ziman rûdinêن û peyvên cotepeyvê nikarin cih biguherînin; lê di Mem û Zînê da me cotepeyvên wekî "sifîd û siyah", "siyeh û sifîd" ku peyvên wê cih diguherînin tesbît kirin.

Çavkanî / References

- Adak, A. (2013). *Destpêka Edebiyata Kurdîya Klasîk*. Çapa Yekem. İstanbul: Nûbihar.
- Ayverdi, İ. (2011). *Misalli Büyük Türkçe Sözlük*. Dördüncü Baskı. Cilt 2.
- Baran, B. (2012). *Rêzimana Kurmancî*. Çapa Yekem. Diyarbakır: Belkî.
- Bedirhan C. & Lescot, L. (2000). *Kürtçe Dilbilgisi*. Beşinci Baskı. İstanbul: Doz Yayımları.
- Develioğlu, F. (2007). *Osmanlıca Türkçe Ansiklopedik Lûgat*. 24. Baskı. Ankara: Aydin Kitapları Yayıncılık.
- Doskî, T. İ. (2022). *Şerha Dîwana Ehmedê Xanî*. Çapa yekem. İstanbul: Nûbihar.
- Dost, J. (2020). *Mem û Zîn bi Kurdîya Îro*. Çapa Duyem. İstanbul: Avesta.
- Ehmedê Xanî (2011). *Mem û Zîn*. Amadekar. Huseyn Şemrexî. Çapa Duyem. İstanbul: Nûbihar.
- Ergin, M. (2003). *Türk Dil Bilgisi*. İstanbul: Bayrak Yayıncılık.
- Ertekin, M. Z. û Açıar, Z. (2015). Di Kurmancî de Cotepeyv û Cûreyên Wan. *Bingol Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 1(1), 82-92.
- Gökalp, B. (2017). Zazakî De Çekuyê Dileti. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*, 2(3), 120-130.
- Hatipoğlu, V. (1972). *Türk Dilinde İkileme*. Genişletilmiş İlkinci Baskı. Ankara: Türk Dil Kurumu Yayıncılık.
- Inkelas, S., & Zoll, C. (2000). Reduplication as morphological doubling. Manuscript: University of California, Berkeley and Massachusetts Institute of Technology.
- Karaağaç, G. (2016). *Türkçenin Dil Bilgisi*. Ankara: Akçağ Yayıncılık.

Karaman, A. (2021). EskiTürkçede (7-12yy) İkilemeler. Malatya. İnönü Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Türk Dili ve Anabilim Dalı Yayınlanmamış Doktora Tezi. Kayseri: Kubbealtı Neşriyat.

Kızıl, H. (2019). Berawîrdkîrûna Taybetiyêñ Daçekêñ Kurdî bi Daçekêñ Îngilizî re ('bi'ya Kurdî digel 'by'a Îngilizî). *Şarkiyat* 11(3), 1524-1546. <https://doi.org/10.26791/Sarkiat.620959>.

Tan, S. (2011). *Rêzimana Kurmancî*. Çapa Duyem. Stenbol: Weşanêñ Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê.

Telli, B. (2017). Düneydoğu Anadolu Bölgesi Ağızlarında Geçen İkilemeler Üzerine Bir Değerlendirme. *Hikmet-Akademik Edebiyat Dergisi*, 3(6), 133-149.

Travis, L. D. (2001). The syntax of reduplication. In *North East Linguistics Society*, 31(2), 1-14.

Tuna, O.N. (1948). Türkçe Tekrarlar. İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi. *Türk Dili ve Edebiyatı Dergisi*, 3, 429-447.

Türkçe Sözlük (2005). 10.Baskı. Ankara: Türk Dil Kurumu Yayınları

Xanî, E. (2009). *Mem û Zîn* (Amd. Huseyîn Şemrexî). İstanbul: Nûbihar.

Yıldırım, K. (2012). *Kürtçe Dilbilgisi*. Birinci Baskı. Mardin: Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiyede Yaşıyan Diller Enstitüsü Yayınları.

Yıldırım, K. (2014). *Dîwan (Ehmedê Xanî Kulliyati-4)*. Çapa Yekem. İstanbul: Avesta.

Yıldırım, K. (2016). *Mem û Zîn Çeviri ve Kavramsal Tahlil*. Üçüncü Baskı. İstanbul: Avesta.

Yılmaz, E. (2014). *Temel Dilbilgisi Terimleri Sözlüğü*. Ankara: Pegem Akademi.

Extended Abstract

Introduction

Reduplications are groups of words based on the repetition of words or, in some cases, parts of words. These structures are included in the subject of phonetics, morphology and syntax as sound events, structures of words and word groups. In this respect, reduplications show the grammatical dimension of the language, but also the semantic dimension of the language as they are structures used to strengthen the narrative. According to Inkelas & Zoll (2000) and Travis (2001), the first studies on reduplication (cf. Wilbur 1973, Marantz 1982, Clements 1985, Kiparsky 1986, Mester 1986, Steriade 1988, McCarthy û Prince 1995) focused more on the phonological dimension of reduplication. However, there has been an increase in theoretical studies on the morphological and syntactic dimensions of these structures. For example, according to Inkelas & Zoll (2000, r. 6), Morphological Doubling Theory is based on the proposals of Hyman et al. (1999), but also in some aspects on the restricted repetitions of Yip (1995, 1998) and the work of Downing et al. (1997 et al.) on morphological phenomena in Bantu language reduplications.

Although Kurdish (Kurmanji) literature has dealt with doubling in gramatic books (e.g. Tan, 2015; Baran, 2012), the first academic study on the subject in Turkey is Ertekin and Açıç's (2015) study. While our study refers to the first studies in the Sorani and Zazaki lite-

rature, it refers to the aspects of the subject that are left incomplete in the first studies in the Kurmanji literature and thus tries to address the subject from a broader perspective.

Reduplications have been preferred by poets and writers as a concept that enriches expression in poetry and prose. Ahmadi Hani, one of these poets, made extensive use of reduplications in his work *Mem û Zin*. *Mem û Zîn*, one of the most important works of classical Kurdish literature, has a rich literary expression with its language, style and figures of speech. In particular, arts such as proportionality, overstatement, contradiction and repetition, which are relevant to our subject, refer to literary style, and some reduplication structures formed with these verbal arts in the context of language features are worth analyzing.

Method And Material Of The Study

This study, which falls within the field of textlinguistics in one aspect, tries to identify and analyze the reduplications in *Mem û Zin* masnavi with a descriptive method and a synchronic approach. For this purpose, our study analyzed the reduplications in the work by comparing the copies of *Mem û Zin* annotated or translated by Yıldırım (2010), Şemrexî (2011), Doskî (2013) û ya Dost (2020). Our study consists of an introduction and two chapters. The introduction briefly covers the conceptual and theoretical framework and includes the method and material of the study. The first part shows the reduplications in *Mem û Zin* in terms of form. In this section, the reduplications are discussed under ten headings and explained with examples from the masnavi. In addition, the reduplications identified in this section are tabulated in numerical data. The second section makes a distinction according to the language to which the reduplications belong. The use of Kurdish, Arabic and Persian words as reduplications is exemplified under eight headings. At the end, the identified reduplications are arranged in alphabetical order and added to the study.

Conclusion

This study, which examines the reduplication structures in *Mem û Zin* and their grammatical features, has identified more than 820 reduplications in the work and stated that some of these reduplications can be included in more than one category. Our study, which exemplifies the reduplications in the text under different categories, has determined that these structures in *Mem û Zin* enrich the narrative and contribute to the literary style of the text.

Recommendation

As one of the studies that emphasize the importance of analyzing the early texts of Kurdish in order to better understand many grammatical structures in Kurdish or to find examples that have not yet been identified, this study suggests that researchers should focus more on the texts of the classical period.